

Azerbaycan dixwaze dest danî ser hin navçeyên din ên Ermenistanê!

»»» R:7



Hevbeşiyên bizava neteweyî ya Kurdistan û hewcehiya yekîtiya netewî

»»» R:3

Agirî

Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

*Duheftînameyek Siyasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdi
www.agirimedia.org Hejmar (410) 22-11-2021 Buha (1000) Tûmen*

Gotûbêj bi merc û veşartina hovîtiya li dijî mirovahiyê

»»» R:4

Asmîle çî ye û kê asmîle dibe?

»»» R:5

Têkçûna jiyanê û herifîna axê

Dema ku wekî her-timî kopaldeştên çewtekar xwaştin siloganan bidin û wisa bidîne zanîn ku kombûnên nerizayetiye bo hişksaliyê bûne û li wir jî bi bejin û balê Weliyê Feqîh re bêjin û bêjin tev ew xelkane tevî dijiwariya jiyanê, her guhgirê Weliyê Feqîh in, lê xelkê amade ên meydanê bi fitiklêdan û hawarkirinê dengê çewtekariya wan birîn û rûyê Weliyê Feqîh reştir kirin.

Roja Înê 28`ê Xezelwera 1400`an a Rojî, hezaran xelk ji bajarê Îsfahanê hatine nav kombûna cotkarên nerazî û piştevaniya neraziya werzêran û cotkarên Îsfahanê kirin. Li wir çendîn silogan bi dijî sîstema Wilayeta Feqîh dan. Xelkê nerazî yên cotyar û werzêrên Îsfahanê li derheq hişkbûna rûbara “Zayenderûd” hatine ser şeqaman ku digel hişkbûna rûbar, çavkaniyên jiyana xelkê jî hişk bûne û dar û zevî û baxên xelkê ji nav çûne û ajeldariya wan bi giştî ji nav çûye.

Jiyana çendîn milyon kes li naverasta Îranê li ser rûbarê

Zayenderûdê ye û derbasbûna wê rûbarê di nav bajarê Îsfahanê de bûye sedemê ve-jîna liqasderçûyiya Îsfahanê û çendîn kargeh û cihên pîşeyên mezin ên wê derê jî li ser rêya rûbar hatine avakirin û salanik e milyonana Dolar dahat bo navraştî Îranê û bi milyardan Dolar jî gendelî bo rêberê rejîmê û Spaha Pasdaran û bandên cur bi curên wê hebûye.

Pirojeyên deştilat-darên rejîmê di pêxema giHANDINA avê bo wê derê, ava çendîn cihên Kurdistanê û Luristanê hatiye girtin û çendîn navçeyên Ehwezê hişk kirine da ku ava Zayenderûd berdewam be, lê pirojeyên gendelkarên rejîmê bi awayekî nezanane bûn ku pêka gotina xwedê ber-pirsên rejîmê, birêve-beriya şaş a avê kavlikarî li pey xwe aniye û êdî ne tenê av hişk dibin û rûbar dibine deştatî, belkî navçeyên navraştî Îranê bi tevahî raştî datepîna axê dibin û ew têkçûna cografîyaya dûrdîmena paşeroja naverasta Îranê ye.

Arîşe û pirs-gêrêka sereke ya li Îsfahanê



bi sedema hişksaliya rûbarê nîne. Her wek rojnameyên rejîmê yên wek rojnameya “Cim-hûriya Îslamî” wisa îdia kiribû ku cotyarên Îsfahanê lewma nerizayeti nîşan dane da ku di wê hişksaliyê de dewlet qerebûya wan bike! Di demekê de eva rêk xelitandina mijarê ye û arîşeya sereke hişksalî nîne. Çimî di hişksalî de bi sedema barîna kêma baranê salekê ava çeman kêma dibin, û di Bihara sala bê de car din kanî û çem ji nû ve dijîn, lê aştengiya sereke ev e ku çavkaniya jiyanê di Îranê de zuha bûye.

Raportên navendî di

navxweyê Îranê de dine xuya ku siyasetên çewt û nezanane yên rejîmê ne tenê bûne sedema zuhabûna çeman, belkî zuhabûna avên binerdî jî di Îranê de geşe kiriye û niha Îran li ser erdeke betal rawestaye û hêdî hêdî zuha dibe û axa wê diherife û cografîyaya Îranê di bin deştilata kolonyalîzma Wilayeta Feqîh de dibe cografîyayek kavilî.

Xwenîşandanên çend mehên derbasbûyî ên xelkê deverên Ehwezê herçiqas bi merema bê avî hate deşt-pêkirin, lê di dawiyê de bûn bi xwenîşandanên dijî rejîmê. Yên Îsfahanê

jî her bi wê mebestê bû û ji 17`ê Xezelwerê ve cotiyar li tenişt pira binavûbang a Îsfahanê û li ser hişkbûna Zayenderûd kom bûn û çendîn roj e berdewam e, ew kombûne jî dibine dijî rejîmê.

Bi watayek din li kombûnên nerizayetiye Îsfahanê de xelk hawar dikin û bi fitiklêdan mohreyên rejîmê rezil dikin, bi wê karê wisa didine zanîn ku çavkaniya rojreşîya Îranê nikare çiyê din axa hişkbûya Zayenderûdê bixe nav çavê xelkê! Xamineyî û rejîma wî sedemê tev rojreşiyên xelkê ne.

Sergotar

Şîn û taziya vala



N: Kerîm Perwîzî

Dema ku rejîmên totalîtare di warê sihir û bîrokeyên dijemirovî û paremayên xwe de kêmtînin, penahê ber bi kiryarên ecêb ve dibin ku tenê û tenê dibe sedemê sivkatîbûna zêdetir û henekarî bi bîroke û îdolojiya wan. Rejîma Xumeynî li ser bingeha çewtekirina dîrok û forma heyetên tazî û “newhexwanî” şikil girtiye û teva-hiya pêkhatiya wê di şiklê heyeteke şîn û tazî de çend care dibe.

Di pêşandana şîn û taziya seranserî de, “Welîyê Feqîh” wekî axûndê derhênerê teva-hiya nimayîşan ku li serweyê meclîsê de rûdinê û mediya û TV jî dibîne mênbera propagende û belavkirina deng û rengê newhexwanî û şîngêrî û jî aliyê dinê jî kopaldestek mêjî rizî ku Spaha Pasdaran rola wî dilîze, car carana bi dengê nesaz hawar dike da ku tevî keşeke şîn û nerihetî, beşdarên nimayîşê û bînerên wê bitirsîne ku neke derbeyekê ji wê xelkê bide!

Ew cure pêşandanên heyeta “şîngêrî” hezaran car dûbare kirine û li deşpêkê xelkek zêde pê dihate xelîtandin, lê piştî derkevîna diwênan wan û betalbûna sihira newheyên wan, êdî xelk ne tenê giriya wan bo şîn û taziyan nayê, belkî henekan bi wan nimayîşan dikin û bi halê xwe ve digirin ku çi kesaneke hakimê dahat û welat in û biriyarê li ser jiyana wan didin!

Her dem ku Komara Îslamî ji kuncê ve raştî lawazî û kêmkuriyan hatibe, bilez heştî û heştikên nexuya kom kiriye û xîstîye nav tabûtekê



û di nav şeqam û bazaran de gerandiye ku eva bicihmayiya filan kesê ye ku li eniya şer an di bûyerekê de hatiye kuştin û carek din ber bi newhexwanî, tazî û şînatîyê ve penah biriye da ku seha xelkê bihejîne û wan bixelitîne û bi vî awayî kêmasiyên xwe ên deştçêkirî veşêre.

Di wan cure pêşandanan de ku berê li taziyan diçûn û niha bûne henekkarî, di salê de çendîn mînakên bi rê ve dibin û wisa didine zanîn ku ew bicihmayiyên şerê Îran û Îraqê yan kuştîyê şerê dijî DAÎŞê yan parêzerên “Herem”ê bûne! Pîraniya wan tabûtane vala bûn! Heta bi vîdiyo jî derkevî ku tabûta Qasim Silêmanî ku ber bi Îranê ve birin, vala bû û çî tiştek tê de nebû! Bo rejîma heyeta “şîngêrî” eva girîng e ku nimayîşek newhexwanî rêk bixe û gendeliyên xwe pê veşêre!

Ew çend roj in ku di Kurdistanê de jî mijûlê nimayîşa teji ji henek in ku wisa dane zanîn wan di çolatiyekê de û di nav doleke “Dîwander”ê de, çend heştî û pîrûskek peyda kirine û xîstine nav tabûtekê û wek îdia dikin yê jinekê ye ku zêdetir ji Sî sal berî niha ve hatiye kuştin! Renge her ew jine bi deştê xwedî rejîmê hatibe kuştin û termê wê di wê cihê de hatibe firedan, niha piştî Sî sal dibêjin heştîyên wê anîne û xîstine nav tabûtekê û di nav Dîwandere û Sineyê de newheyê bo dixwînin û taziye bo digirin!

Tabûtên vala û betal ên rejîmê ku tene gerandin û kesek wek paşmayî Qasim Silêmanî jî tê û nimayîşa wê gerimtir dike, di raştî de nimayîşa valabûna xwedê rejîm û derkevîna betaliya mêjiyê kopaldestên wê ye ku li dor tabûtekê veşartî ya vala de, şîn û taziyeke vala bi rê ve dibin û zêdetir ji hemû demekê, herifîna tev îdeyên paremayên xwe û tepbûna propagandeyên bê naverokên xwe pêşan didin. Şîn û taziya vala ya “şîngêrî”ên newhexwaniya “Wilayeta Feqîh”, valatiya mêjiyê wê rejîmê û darûdesteyên wê dide îsbatkirin.



Hevbeşiyên bizava neteweyî ya Kurdistan û hewcehiya yekîtiya netewî



N: Mecîd Heqî

Gelek caran li dost û hevalên Kurdan ên biyanî tê bihîstin: “Em dixwazin alîkariya Kurdan bikin, lê Kurd bixwe nizanin çî dixwazin”! Eva raştiyeke li hemû beşên bizava Kurdistanê tê dîtin. Li pêwendiyên navnetewî de ji bo ku pirsê xwecehî bigihe asta navnetewî hewce ye ew pirsê siyasiye bandorê li ser berjewendiyên welatên pêwendîdar bi herêmê dabinê û çareserkirin an çaresernemana wê bandordar be li ser berjewendiyên netewiya welatan.

Pirsa Kurd ji hemû aliyekê ve ger bê mîzeşkirinê dî tenê pirsê navxweyî ya welatên dagîrkerên Kurdistanê xasmanî Îran û Tirkîyê nîne. Em ji bo ku bikaribin bi xasmanî û balkêş û konsentre ve bi axivin, tenê mijara Rojhelatê Kurdistanê wek mînak dixin ber basê:

1- Bihêzbûna pirsê Kurd li Rojhelatê Kurdistanê, bûye hander û motîvatorek bihêz ji bo neteweyên din ên bindestê Îranê wek Azerbaycan, Belûç, Ereb û Gîlekiyan. Doma erdnîgariya axa her yek ji wan netewane xasmanî Arab, Azarî û Belûç dikeve nav welatên din û pirsên wan netewane her wek pirsê Kurd pirsê welatên cîran e. Cudahiya vê yekê eva ye ku di welatên din ên cîran de ji bilî gelê Kurd neteweyên din bindest û mafê wan nehatiye binpêkirin. Digel wê jî asta kûrbûna pirsê Kurd li her welatekê bandordar e li ser pêwendiyên wan welatana. Welatên dagîrkerê Kurdistanê tevî hemû dijhevî û pirs-girêkên di navbere xwe de li hember pirsê Kurd yekgirtineke ştratejîk hene.

2- Welatê Îranê bi hegera siyasatên xwe yê fitneçî û



destêwerdan di karûbarên nawxweyê welatên herêma Rojhelatê Navîn de, dostek mîcid di herêmê de nîne. Eva tevî bûna rejîmên dîktator li herêmê meydanek nû a dîplomatikî ji bo tevgera Kurd li Rojhelatê vedike. Deriyek ku bikaribe berjewendiyên hewbeş ên wan welatane û tevgera Kurd li Rojhelatê bigehîne hev. Li xebata rizgarîxwazaneya netewê Kurd, diviya bingehe ne îdealîsma îdyolojî be belkî berjewendiyên netewî û hevbeş di hemberî dujminê hevbeş de bin. Ji ber ku Kurd dînamîka guhartina herêmê ye.

3- Welatên Rojava xasmanî Ewropa û Amerîka bi hegera hebûna nîrx û buhayên hevbeş digel bizava netewiya Kurd û herwisa bi hegera pirs-girêkên ştratejîk digel dewletê Îranê, aliyên baş in ji bo diyalog û diplomasiyek netewî, da ku li çarçoveyên zagonên navnetewî de dewleta Îran bikeve bin zexta navnetewî û herwisa sazîkirina pîrek diplomatîk li derveyê bazneya Rojhelatê Navîn li ser pirsê Kurd li Îranê. Di vê çarçoveyê de hewce ye bizava Kurd xwedî bandor be ji bo lobîgerî û dîplomasiya çalakane û bi xasmanî li warê berjewendiyên ştratejîk û nîv-dem de.

4- Zilhêzên herêmî wek dewleta Federaliya Rûsiye, tevî hebûna pêwendiyên aborî, leşkerî û hevpeymanî ji bo dijberiya Amrîka, Îran ne wek dostê xwe yê ştratejîk dibîne. Li dîroka nîzîk de Îran piştevaniya locîstîkî û

siyasî daye hêzên cehadiyên Çêçênîstanê û herwisa ji ber bûna pirsên netewî li Îranê, di dema referandoma 2016 a veqetandina herêma “Kîrîme” ji Rûsiyayê, Îran bi awayek kiryarî dijî vê yekê bû û piştigîrî li “yekîtiya axa Ukraynê” dikir. Digel vê yekê jî dewleta Rûsiya hertim dixwaze kartên givaşî li hemberî rejîmê Îranê de bi destê xwe hebe. Tevî vê yekê, Rûsiye welatek bi bandor û nîzîktirîn zilhêzê cîhanê bi Kurdistanê ye û hebûna pêwendiyên diplomatîk digel welatek ku endamê şewra tenahiya nawnetewî ye, girîngiyek ştratejîk bo tevgera Kurdan heye.

Gelê çima tevî hebûna diya-sporayek bihêz a Rojhelatê Kurdistanê, tevgera Rojhelatê xwedîyê dîplomasiyek bihêz a xwe nîne?

Bersîvdana vê pirsyarê dikaribe bibe hegerê vekirina gelek girêyên pêwendîdar bi xebata me ya netewî li astê navnetewî de. Mixabin bi hegera nebûna ştratejiyek diplomatîk li astê rêxistinên siyasî û herwisa nebûna ştratejiya komkirina hêz û şîyanên hewbeş di bin armancek hewbeş de gelek şîyan, potensiyal û şarezayiyên netewê me nehatine bikaranîn an jî bi awayek bê armanc tînin bikaranîn. Lewma di rewşa îroyî ya Rojhelatê Kurdistanê û arîşeyên siyasî yê dever û navnetewî de hewce ye em Kurd bi piraktîk bibin xwedîyê hevberdiyek netewî. Bûna Navenda Partiyên

siyasî yêpn Rojhelatê Kurdistanê, hewcehiyek bingehe e, lê tîra wê nake, nemaze ku li warê dîplomasiyê de kêmasiyên bizava netewî pir in: Nebûna armancên hewbeş û nivîskî ku hemû partî û sazîyên siyasî yê Rojhelatê Kurdistanê bi armancê xwe bizanin. Nebûna bankeka zanyariyên diplomatîk ku bikaribe bibe bingehek bo karê hevbeş û nebûna kesên pîspor û şareza li astê kadrên pêwendiyên partîyan de.

Pirsa netewî tenê pirsê partiyên siyasî nîne, pirsê hemû takên Kurd e yê ku xebatê dikin ji bo gihîştinê bi mafê çarenivîsa xwe. Li rapora kongireya 9 a Hizba Demokrat a Kurdistanê Îranê de hatiye: “Xebat di nav welat û derveyê welat de, wek dû balên balindeyekê ne, ku ev dû balane bi hev re hev û dû tevav dikin.” Rêberê şehîd Dr. Sadiq Şerefkendî li axivtina xwe de daxwaz li xelkê dike ku her kes bi gor şîyana xwe beşdarî ji xebata netewî bike.

Em li serdemekê de dijîn ku hewce bi rêxistinên hîbrîdî (hybrid) dike, ew hewcehiye xasmanî li warê xebata diplomatîk û hewbeş de hewce ye. Lewma ji bo ku tevgera netewî ya Rojhelatê Kurdistanê bikaribe bi bandor be, hewce ye hemû şîyanên netewî bi hev bînin komkirin û armancên hewbeşên bizavê bibin dînamîk û bingeha bi hev re karkirin û xebatîkirin. Dema gotinên me yek bûn, û em bûn yek, cîhan wê dengê netewê me bibihîze.

Gotûbêj bi merc û veşartina hovîtiya li dijî mirovahiyê



N: Serbest Urmiye

Roja 25`ê Xezelwerê, saleke din jî bi ser komkujiya rejîma Îslamî ya Îranê re derbas bû. Hovîtiyek ku rejîmê tê de dest ji kuştina jin, mêr, pîr û kal û heta zarokan jî hil negirt.

Di heyamê çil salên derbas-bûyî de, xwenîşandanên nerazîbûnê yên meha Xezelwerê yên sala 1398an a Rojî li dijî rejîma Komara Îslamî ya Îranê, yek ji bûyerên siyasî – civakî ên herî balkeş û teji li xwîn û kuştin bû. Herçend ku meşên nerazîbûnê di destpêkê de bi sedema bilindbûna nirxa benzînê bû, lê di demeke kurt de bûne meydana nîşandana kerb, kîn û nerazîbûna ku bi salan bû ji ber serkut û zordariya rejîmê di civaka Îranê de hatibûne veşartin.

Xwenîşanderên nerazî bi eşkere ragihandin ku armanca wan ya sereke guhertina rejîma Îslamî û bi xasmanî rêberê rejîmê ye. Lewma rejîm bi xurtî li hember sekinî û bi qutkirina hêlên ragihandinê, bi taybetî internetê, di hewleke ne serkewtî de hewil da ku him pêşiya berfirehbûna xwenîşandanên di hundirê Îranê de asteng bike û him jî dûr ji çavên sazî û navedên herêmî û navneteweyî di bîdengîyeke tevav de dest avête qirkirin û fetisandina dengên dijberên xwe. Ew jî bi rengekê ku heya niha jî hemû dinya matmayî hiştiye û sîbera reş a hovîtiya Komara Îslamî ya Îranê rê nedaye ku çi berçavrohnîyek ji raya giştî ya cihanî re were dayîn.

Herçend ku komîteya sêyem a saziya NYê pinpêkirina sistematîk a mafên mirovan



di Îranê de şermezar dike û tekezê li ser lêkolînên bê alî û bawerpêkirî li dor hemû cure pêpeskirina mafên mirovan weke girtin û vendakirina zordestî, li sêdaredanên ne yasayî û jiholêrakirina şahîdên cinayetên rejîmê dike, lê raştîyên li dor hovîtiya rejîmê di bûyera han de hêj bi tevahî nehatine eşkerekirin. Tevî daxwaziya civaka navneteweyî û saziyên cihanî yên mafên mirovan, rajîma Îranê heya niha jî bersiveke seraşt derheq kuştîyên nava bajêr, yên ku du bin îşkenceya dezgehên ewlekarî û leşkerî de hatine kuştin û yên ku di girtîgehan de ne û heya cihê girtîgehan jî ne xuya ye, nedaye raya giştî û navneteweyî.

Ji bilî ku rejîma Îranê teslîmê îradeya cihanî nabe û netenê amade nîne ku zaniyariyên seraşt derheq bûyera reş a Xezelwera 1398`an a Rojî de bide raya giştî ya Îran û cihanê, belkî gefan jî, ji civaka navneteweyî û bi xasmanî aliyên xwe yên di gotûbêja li dor bernameya navikî wate "Bercam"ê de dixwe ku dadgeha navneteweyî ya gel di vê derheqê de bidin sekinandinê.

Dadgeha navneteweyî ya gel ku bi alîkariya Sê rêkxistinên "mafên mirovên Îranê, wekhevî bo Îranê û bi hev re li dijî li sêdaredanê", û bi armanca vekolînê li dor aliyên cur bi cur yên bûyerên payîza sala 1398`an a Rojî di Îrane de, li bajarê Lendenê hatiye lidarxistin, di daxuyaniya xwe ya roja 18`ê meha Xezelwera îsal de ragihandiye ku dadgeha han hewil dide ku aliyên dijî mirovî yên kiriyarên rejîma Îranê, rêberê rejîmê wate Elî Xamîneyî û Îbrahîm Reyîsî, Serkomarê niha û berpirsiyarê wî çaxî yê Dezgeha Dadweriya Îranê, bide eşkerekirin. Li gor danezanîna dadgeha han, dê di hola dadgehê de şahîdî dana 45 kes ji zirardîtiyên Xezelwerê were vergirtin û 120 kes an jî îfadeyên xwe bo şahîdiyê danê û derheq bûyerê bi nivîskî ji dadgehê re şandine.

Di demekê de ku rejîma Îranê li hember siyasetên xwe yên li dijî ewlehiya navneteweyî û bernameya xwe ya mehandina Uraniyomê bo bideştveanîna çekên komkuj, di bin givaşa navneteweyî de ye, di heman demê de jî, ji ber hovîtiya xwe û pêpeskirina maf û azadiyên mirov di Îranê de ji aliyê civaka navneteweyî ve tê şermezarkirin. Dadgeha ku li dor hovîtiya rejîmê û rêber û Serkomarê wê hatiye lidarxistin, li gor ya jê texmînkirin, berçavrohnîyeke erênî li ser rejîmê nade raya giştî ya cihanî, lewma berpirsiyarên rejîmê ketine dijberiya tevalî û hemû hewla xwe didin ku pêşiyê jê bigirin.

Di vê derheqê de û li gor ragihandina rêkxistinkarê dadgega navneteweyî ya gel li Lendenê, "Elî Baqirî Kenî", Cigirê Wezîrê Derve yê rejîma Îranê, di civînekê de gel li rayedarên Berîtanîyayê xwariye ku hekî ev dadgeha navneteweyî ya gel nehê sekinandin, dê beşdarî gotûbêjên navikî de nebin, yan jî dê hind ji mijarên gotûbêjên han ji aliyê Îranê ve werin sekinandin. Eva di demekê de ye ku berê jî Cihgirê nûnerê Îranê yê di NYê de, biriyarnamê wê saziyê li dor bûyerên meha Xezelwerê û kiriyarên hovane yên rejîma Îranê, pengaveke siyasî ya neraşt dabû zanîn.

Asmîle çî ye û kê asmîle dibe?



N: Rizgar Beharî

W: Sîmîn Rûhanîzade

Di heyama salên derbasbûyî de peyva “asmîle” gelek tê bihîştin ku renge sedema vê yekê bilindbûna aştî zaniyariyan û geşeya torên civakî û pîrsa nasnameya netewî be. Di cîhana siyasetê de wateya asmîle an ku helandina gelek lewaz û biçûk di nav neteweyek serdest û bihêztir de ye; di piroseya asmîlasyonê de gelê xwedî hêz û serdest gelê lewaz qurt dike û asmîle dike, di encam de takên civaka asmîlebûyî, nasnameya xwe ya rastîn ji dest didin û ji bîra wan diçe ku kê bûne, kesên civaka asmîlebûyî bi cihê vê ku şanaziyê bi nasnameya xwe bikin, şanaziyê bi helbestvan û kesayetî û dîroka gelê dagîrker dikin; lewma eger gelek huşiyar nebin di nava gelê xwedî hêz û deshilat de dihelin û ji nav diçin.

Ti carî wekî îro pîrsa nasnamexwziya netewî di nav gelên dagîrker yên wekî Kurd, Belûç, Erebi û ... ên ku di wê cografîya siyasî de ku bi navê Îranê hatiye naskirin, berçav nebûye. Ew pîrsiyare li cem takên gelên dagîrker çêbûye ku dîrok û derbasbûya wan çî bûye, çima gelê dagîrker ji Tehranê nehêlaye geşe bikin, çima nabe wan desthilata siyasiya xwe hebin, an aliyê kê bi zimanê xwe bi axivîn û binivîsin? Çima bi awayekê nerim nasnameya wan ji aliyê desthilata Tehranê ve bikêmtir tê nîrxandin û hewlê didin ku zimanê wan bikin Farsî û di nava baladestî û îdeolojiya Îranî de bihelin?

Îdeolojiya Îranî
Sentralîstên Îranî niha bi micidî mijûlê pîrozkirina “toxm” û pêkhatayên Îranîbûn û îdeolojiya san-

tralîzmê ne. Îdeolojiya Îranî ji çend toxman pêk tê, wek mînak: Axavtina bi Farsî û hezkirina zimanê Farsî Zimanê Kurdî wekî zaraveyek ji zimanê Îranê dizanin!

Baweriya tevav bi yekparçebûna cografîyaya siyasî a nihaya Îranê.

Dijayetîkirina her cure bîr û bawerek bo mafê diyarîkirina çarenivîsiyê, ku Îranî wan kesên ku bawerî bi wê mafê rewa heye bi “Tecziye Teleb” binav dikin.

Şanazîkirin bi dîroka sexte a Îranê û “Kurûş” û helbestvan û kesayetiyan wan û tev dîroka destçêkirî ku di ragihandinên Tehranê de û heta ragihandinên opozîsyonên Îranî di Ewropa û Amrîkayê de li cem xelkê xwe pîroz dikin.

Ev beşek ji wan pênaseyan bûn ku îdeolojiya Faris û Îranîbûnê pêk tîne.

Di heyama wan çend sedsalên derbasbûyî de, desthilata Tehranê bi mîkanîzmên wekî “zor û hêz” an “çewtekarî û propagende û şerê nerim” xwe bi ser gelê Kurd, Belûç, Erebi û netewên dinê de bisepîne û rê nede ku ew gel bîr ji nasnameya xwe bikin û li pey maf û daxwazên xwe bikevin.

Armanca stratejiya Tehranê bindesthiştina gelên din û asmîlekirina wan e. Bi vê pêkê, desthilatdarên Tehranê bi dirêjahiya dîrokê hewl dane ku netewa Kurd kêmtir bikin û di nav xwe de bihelînin û wekî mînak hewl dane gelê Kurd bi beşek ji gelê Îranê binasînin û zimanê Kurdî wekî devokek Îranî binav bikin û rêûresm û hîkeftên Kurdî yên wekî Newroz di Saziyên Navnetewî li ser Îranê tomar bikin. Di encam de bi derbasbûna demşarîstaniyeta Kurdan ji nav birine û li ser navê xwe tomar kirine.

Şerê psîkolojîk

Yek ji mîkanîzmaya asmîlekirin û biçûkkirina netewa Kurd şerê psîkolojîkî ye ku Fars di Îranê de û Tirk di Tirkiyê de bi dijî Kurdan rêk xistine; wekî mînak sivkayetîkirina Kurd, bi gundî nîşandan û

paremayî nîşandana Kurdan an jî wekî xelk û kesên kuvî û nexwendekar di nava ragihandinên fermî, belavok û çapemeniyên xwe de nîşan didin; ev yeka bi tenê beşek ji şerê nerim û psîkolojîkî li dijî Kurdan e. Hevdem Kurdan wekî “merzdarane xeyûr” “Kurdhayê ezîz” “Kurdê Îranî” jî bi nav dikin û bi wî awayî wesfa Kurdan dikin ku bi armanca xapandin û xelitandinê ye ku di çarçoveya şerê nerim û listokên siyasiyên dagîrker de ye. Encama wî şerê psîkolojîkî ev e ku eger takê Kurd hişiyar û şareza nebe seh dike ku liberîkirina kincên Kurdî û axavtina bi zimanê Kurdî şerim e û mirov pê kêmtir dibe; lewma hewlê dide ku bi awayek bi axivîn û reftarê bike ku dagîrker jî razî be ku êdî nebe mijara henekên wan! Eger takê Kurd bikevine wê dafê û telikê, dagîrker digîhîje bi armancên xwe, lê eger takê Kurd hişiyar be nakeve wê dafê û û pilana dagîrker pûç dibin.

Koç û veguhestin

Bi dehan û sedan sal e Kurd bo dabînkirina hewcehiyên jiyana xwe neçar mane ku awareyê parêzgehên din yê navenda Îranê û welatên din bibin; krîza aborî, beşek ji Kurdan neçar kiriye ku warê xwe bi cih bihelînin û ber bi deverên din ve herin, eva jî yek ji wan rêyan e ku rejîma Tehranê girtiye ber xwe, çimkî Kurdên ku akinciyê parêzgehên din dibin hêsantir asmîle dibin û di nav gelên din de dihelin.

Geşedan bi bêhêvîti

Mîkanîzmek din bo asmîlekirina gelê Kurd, geşedan bi bêhêvîtiyê ye, gelê bê hêvî û bê derfet, bi yekcarî teslîm dibe û dest ji şoreş û serhildanê ber dide û xwe radeştî desthilata tepeserker dike.

Gelê Kurd neteweyek şorşgêr e û ti car zilmê qebûl nake, dagîrkerên Kurd bo şikandina berxwedana Kurdan şerekî psîkolojîkiya diwar li dijî Kurdan rêk xistine. Rojane kolber û şorşgêran dikujin û bi berdewamî girtiyan îdam dikin, bikom xelkê binçav dikin û xelkê hejar dikin, eva tevliheviyek ji şerê “nerim”

û “zorê” ye. Rejîma Tehranê bi awayê sistematîk û rojane Kurdan binçav dike yan wan dikuje û bi vî awayî girtin û rijandina xwîna takên Kurd asayî dike û hewl dide ku sama xwe bi ser civaka Kurdiştanê de zêdetir bike. Armanca wî şerî psîkolojîkî, xistina bêhêvîtiyê li nav dilê takê Kurd de ye. Her çend ku rejîma dagîrker a Îranê xerçek zêde bo wî şerî daye, lê tê dîtin ku roj bi roj di Rojhilatê Kurdiştanê û bi taybet di bajarên wekî “Kirmaşan û Îlamê” de ku dijmin hewl daye Kurdayetiye tê de reş bike, û seha nasnamexwazî tê de mezintir dibe.

Sepandina zimanê Farsî Yek ji girîngtirîn emraz bo asmîlekirina gelê Kurd sepandina zimanê Farsî ye. Rejîma Fars a Îranê ku bi sedan sal e xwediyê “çek” û “desthilat” û “ragihandin”ê ye, ji tevahiya wan wekî amrazek bo biçûkkirin û jinavbirina zimanê Kurdî bi kar anîye, sivikayetîkirin bi zimanê Kurdî yek ji berçavtîrîna wan mîkanîzmane ye ku wan mifah jê wergirtiye bo vê ku takê Kurd şerim bike bi Kurdî neaxive; heta wan mifah ji saykolojî û zaniştî psîkolojiyê jî wergirtiye û bi henekkirin û siviknîşandana zimanê Kurdî, hewl dane ku kesayetiya takê Kurd bişikînin û heta axavtina bi zimanê daykiya xwe bo xwe bi şerim bizanin û axavtina bi zimanê Farsî bi pêşkevîtinê bizanin. Ev yeka di halekê de ye ku bi sedema bihêzî û resenayeti û dewlemendî û serbixweyîya zimanê Kurdî, em dibîbîn ku roj bi roj zimanê Kurdî pêş dikeve û di hember de tevî xerc û zehmetek zêde ku salan e bo afirandina zimanê Farsî tene kirin û bi dizîna peyvyan ji zimanên dinê ve hêj nekarîne zimanê Farsî ji bin bandora zimanê Erebi de der bixin.

Di encam de ziman ew nasname ye ku eger gelek neparêze bi derbasbûna dem ew gel piştî guhîrîna zimanê xwe, kultûr û dabûnerî û hemû pênaseyên xwe ji dest dide û xwe di kevîlê gelê zal û dagîrker de dibîne û dihele û bi tevahî asmîle dibe.

Jeopolotîk û curên wê (beşa 1)



N:Bêhzad Qadirî

W: Bêhzad Simko

Jeopolotîk:

Wateya Jeopolotîk bo cara yekem di sala 1899an de, ji aliyê zanayê Swêdî “Rudolf Kjellen” ve hate bikaranîn. Ew “çemk”e wek “çemk”ên din ên zaniştên mirovî gelek pênasên cur bi cur ên wek “cografiya, hêz, siyaset û rikeberî” li xwe digire; Hin ji zana, jeopolotîkê bi zaništa gengeşeya fakterên cogirafiyayan û biryarên siyasî dizanin.

Hin ji zanayên din, Jeopolotîkê bi şêwazên xwendin û nivîsandina siyasetên navnetewî ji aliyê xwediyê desthilat, hizir û bandora wan li ser biryarên siyasî li ser asta netewî û deverî dizanin. Hin zanayên din jî Jeopolotîkê bi karlêkeriya derdor an diyardeyên derdor ên wekî “cihê cografiya, şêwaza erdê, çavkaniyên bê mînak, ximetguzariyên pêwendî û şandin û alavên pêwendiyên giştî û... hwd” li ser biryarên siyasî û bi taybet li asta dever û cihanê dizanin.

Hin zanayên din jî, Jeopolotîkê bi wateyek çend binyatî û hilgirê “cografiya, siyaset û hêz”ê pênase dikin. Bi giştî û her curekê ku Jeopolotîkê bê pênasekirin, di wê zaniştê de, rola derdor an cografiya wek yek ji girîngtirîn sedem li hevkeşeyên siyasî û hêzê de tê berçavgirtin. Jeopolotîka şariştaniyetî Dîroka Jeopolotîka şariştaniyetê di warê rêkevtê de beranber e digel salên 1815-1875an; Di wê dewreyê de Bîrîtaniya wek navenda aborî û yek ji welatê sereke yê pişeya nû dihate hisêbandin. Ew welate cemserê



aboriya cihan û navendên dahat û hêzê bû. Hêdî hêdî welatên din ên wek Alman û Amerîka hatine nav meydanên pişê û aboriyê û edî sermayeguzarî di Ewropayê de bi hebûna rikaberên nû wek caran bo Bîrîtaniyayê balkêş nebû, her lewma ew welate di hizira berfirehkirina desthilata xwe û derzkriin di nav welatên din de bû.

Bi sedema vê ku di wê serdemê de Ewropiyan hêz û dahateke zêdetir hebûn, xwe di navenda biryarên cihanê de dibînin û di wan heya-man de Ewropa li pey îdaya eqlaniyeta “Cîhan wetenî” ya li ser binyata pîverên Ewropayîyan bû. Di wê serdemê de pêbendbûn bi yekîtiya şariştaniyeta Ewropayê li beranber xeyre Ewropiyan hebû. Ji dîtingeha Ewropiyan ve herçiqas çand û melbendên din ên xeyre Ewropî derbasbûyek tejî şanazî jî hebûbin, lê bi derkevtina şariştaniyeta Ewropî, yên din neçar bi vergirtina pîverên şariştaniyeta Ewropayê ne. Ew cure hizrîn, pêgeha rewatîdan bi “tekrewiyên” Ewropayê di hemû cihanê de pêk anî. Jeopolotîkka şariştaniyetê bûye sedemê guherîna pêwendiyên civakî û çandî, di wê cure dîtingehê de, Ewropa bûye bi cemser û navend û deverên dinê wekî perawêz hatine dîtin. Regezperestî û rasîsma Ewropayê berhema dîdingeha zal ya wê serdemê bû.

Jeopolotîka surûştixwaz

Jeopolotîka surûştixwaz di serdemê salên 1875an heta piştî şerê duyem yê cîhanî (1945) li ser bingeha pîverên netewexwazî li Ewropayê û rikeberiyên hundirî yên Ewropayê hate gorê. di wê serdemê de Jeopolotîk wekî şêwazek ji zaništa hêz û mijara rikeberiya hêzên koloniyalîstî bo berfirehtirkirina dagîrkerî û geşedan bi pişeya pêşkevî, bal li ser hate kêşandin.

Di wê serdemê de neteweperwerî di welatên Ewropayê de bi lezgînî di halê geşekirinê de bû û rikeberiya welatên bi hêz ên wekî Bîrîtaniya, Alman, Feranse û Rûsiye bo bi sedema qewimîna şerên cîhanî yên yekê û duyê. Her yek ji wan welatan bo bideştveanîna berjewendiyên netewî, xwe ji ti karekê nediparastin. Nîşaneyên netewî û regezperestî û rasîsm, ji pîverên wê serdemê yên nasîna jeopolotîkê ne. di wê serdemê de girîngtirîn teoriya Jeopolotîkî ji aliyê zanayên wê warê ve hatine pêşkêşkirin ku armanca wan berfirehtirkirina binyata derzkirin û sepandina siyasetên wetatên xwedî berjewendî bû.

Jeopolotîka îdeolojîkî

Ew dewreye benaber e digel salên 1945 heta 1989an. Piştî şerê duyem yê cîhanê û bi serkevtina welatên “mot-tefiq”, formdan bi siyaseta cîhanê li navbera du cemserên îdeolojîka kapîtalîsm bi rêberatiya Amerîka û sîstema

sosyalîstî bi rêberiya Rûsiyê hate danîn. Rikeberiyên îdeolojîkî yên wê serdemê, cîhan bi du beşên Rojhilat û Rojava dabeş kir. Beşeke zêde ji welatên pêşkevî yên cîhanê û herwisa welatên demokratîk û lîberal ên girêdayê Amerîka û sîstema kapîtalîzmê bûn.

Rikeberiya aborî, siyasî, ewlehî û çandî li navbera du aliyên îdeolojîk, welatên cihanê li ser sê astên, cihana yekem (Amerîka û welatên Rojavayî), cihana duyem (Soviyet û rojhilatê Ewropa) yê, cihana sêyem (welatên hejar ên Afrîqa, Asiya û Amerîkaya Latîn) de hati-bûne dabeşkirin.

Jeopolotîka postmodern

Sedema Jeopolotîka postmodern piştî bi dawîhatina sîstema Jeopolotîka îdeolojîk hatiye destpêkirin. Ew dewreya ku ji sala 1990an ve heta niha berdewam e, cihan ji sîstema nezma berê aniye derê. Di vê dewreyê de Amerîka bi şikeştana Soviyetê, bû bi yekemê bê rikeber di cihanê de û wekî zilhêzek bê rikeber xwe da nasandin. Em dikarin ji taybetmendiyên wê dewreyê, îşare bi wan xalane bikin: “Welatperweriya modern û avabûna welatên nû, terorîsm, binajoxwaziya Îslamî, tedaxula leşkerî, yekîtiya deverî (Yekîtiya Ewropayê), NFTA (Welatên Amerîkaya Bakur), ASAN (Welatên başûrê rojhilata Asiya û Oqyanûsiyê)

Nerîna Lîderan



“James Risch”:

“Îran bi navê Bercamê dem derbas dike ku bigihe bi çeka navkî”.



“Muqteda Sedir”:

“Nabe kes di karûbarê komîsiyona bilind a hilbijartinê de mudaxilê bike û hin alî dixwazin encama hilbijartinê biguherînin”.



“Benny Gantz”:

“Em piştevaniya wê rêkvevtinê dikin ku Îranê di warê bombeya navkî de pare bihêle”.



“Brett McGurk”:

“Amerîka ji bo gefên Îranê dê di Rojhilata Navîn de bimîne”.

Azerbaycan dixwaze dest danî ser hin navçeyên din ên Ermenîstanê!



N: Eskender Ceiferî

Ev çend meh in ku Azerbaycanê bi piştevaniya Tirkîyê dest daniye ser beşeke zêde ji axa Ermenîstanê.

Nagorno Qerebax an Qerebaxa Jorîn an jî Komara Qerebaxa Çiyayî, ku wek Artsax jî dihat naskirin, dewletek bû ku di asta nevnetewî de bi fermî nedihat naskirin. Li gor saziya Neteweyên Yekbûyî, ewder, perçeyek ji axa Azerbaycanê ye. Lê di raştî de ewder wek dewleta DEFACTO ji Azerbaycanê veqetiya bû.

Ew, heman dewlet bû ku Azerî û Tirkan tîk bir.

Komara Nagorno Qerebaxê li başûrê rojavaya Azerbaycanê ye. Ew li rojhelat bi Azerbaycanê re û li rojava jî bi Ermenîstanê re hevsînor e.

Ji danezanîna serxwebûna di 1991'an vir ve, zimanê fermî yê Qerebaxê, Ermenî bû. Lê piştî ku Azerbaycanê dest danî ser vê navçeyê, Azerî kire zimanê fermî.

Tevî ku heşîmeta herî zêde ya vê navçeyê Ermenî ye û hinek Kurd jî li wir dijîn, lê di raştî de ne kesek piştî Kurdan digire ku ew li wir bibin xwedî maf û ne jî kesek bi êşkere piştî Ermenîyan digire. Saziya Neteweyên Yekbûyî ku weke saziya ji bo paraştina mafên neteweyan tê binavkirin, ji bo paraştina mafê Ermenîyan li wir tev nagere.

Raşt e li wir şerê Kurdan nayê kirin lê belê şerê Ermenîyan û hemû wan pêkhat-eyan tê kirin ku li dijî serdestiya Azerbaycanê li wir tev digerin.

Mijar kûr dibe û di rojên derbasbûyî de Tirkîyê bi awayekî êşkere ragihand ku ewê li hemberî Ermenîstanê di eniya Azerbaycanê de bin heya tevahiya navçeyan ji destê Ermenîstanê yan jî wê dewletê derxînin ku tenê Ermenîsan li piştî wê ye.

Li gor serjimêriya herî dawî ya Ermenîstanê ku sala 2011'an hatiye encamdan, li vî welatî bi giştî nêzîkî 38 hezar Kurdan dijîn ku ji 35 hezar kes ji wan re Êzîdî tê gotin û ew 3 hezar kesên din jî wek Kurd hatine binavkirin.

Helbet tê gotin ku Ermenîstan jî qet li mafên Kurdan mikur nehatiye. Lê belê di vê navberê de pirtirbûna heşîmeta Ermenîyan li wê navçeyê, nîşan dide ku ew navçe, mafê Ermenîyan e. Ji xeynî hin gund û navçeyên biçûk ên Azerîyan, lê belê navçeyên din hemû yan jî pîranî Ermenî ne.

Li Azerbaycanê jî ji Kurdan re tê gotin Azerî. Li wir qet zimanê Kurdî bi fermî nehatiye naskirin.

Di vê navberê de hin welat jî hene ku dixwazin rewşê aram bikin. Amerîkayê ragehand, ku çekdarên Sûrî ji Lîbya re hatine veguheştin û ew bûye sedema alozî, şer û kuştinên zêdetir.

DYA hweisa Tirkîye hişyar kir û ragehand, şandina çekdarên Sûrî bo şerê navbera Ermenîstan û Azerbaycanê heman alozî û şer û kuştinên li Lîbyayê dê li wê navçeyê jî dubare bike.

Beriya niha jî Rewangeha Sûrî ya Mafên Mirovan ragehandibû, heta niha hejmara çekdarên Sûrî li Azerbaycanê geheştîye 850 çekdaran û bendewarî hene hejmarekî zêdetir a çekdaran ji aliyê Tirkîyê ve bînin şandin.

Di şerê Azerbaycan û Er-

menîstanê de bi dehan çekdarên Sûrî yê ku Tirkîyê ew şandine şerê Ermenîstanê, hatin kuştin.

Rewangeha Sûrî ya Mafên Mirov ragihand, di 48 demjimêrên borî de, 36 çekdarên Sûrî yê ku Tirkîyê ew şandine eniya şer, hatine kuştin û bi dehan jî birîndar bûne.

Wê saziya sivîl da zanîn, bi giştî heta niha 64 çekdarên Sûrî li Qerebaxê hatine kuştin.

Tirkîye ku di şerê Qerebaxê de piştevaniya Azerbaycanê dike, hejmarek ji çekdarên opozîsyona Sûriyê tevî wî şerî kirin. Li gor zanayriyên Rewangehê, heta niha Tirkîyê 1200 çekdarên Sûrî şandine şerê Qerebaxê.

Hevdem serokwezîrê Ermenîstanê Nikol Pashinyan bang li civata navnetewî kir, da ku piştî raşt bibin ku Tirkîye destê xwe nexwe nava nakokiyên di navbera wan û Azerbaycanê da li ser herêma Nagorno – Qarabaxê.

Ev hişdarî ya ji aliyê Serok hikûmetê Ermenîstanê ve di wî çaxî de hat ku şer di navbera Ermenîstanê û Azerbaycanê da derketî û Tirkîyê piştevaniya xwe bo Azerbaycanê diyar kiribû.

Balyozê Ermenîstanê li Moskowayê Fardan Taganyan jî daye zanîn ku Tirkîye 4 hezar komên çekdar ê Sûriyê bo şer li dijî Ermenîstanê bikin bo bereyên şer ê Azerbaycan û Ermenîstanê şandine.

Herwiha Fardan Taganyan tekez jî kiriye Tirkîye wan komên tûndrew ê Sûriyê perwerde kirine û dixwaze wan di şerê li dijî Ermenîstanê de bikarbîne.

Îranê helwesteke cuda hebû û tenê dixwaze berjewendiyên wê paraştî bin.

Korerêyên li pêş Tirkîyê



N: Ebdûlazîz Qasim

Wekî hemû dizanin ku ne-heqiyeke siyasî, aborî, olî û netewiya mezin di sîstema deşhildariya hemû dewletên Rojhilata Navîn de heye, û peydabûna serhildanên li dijî sitem û dîktatoriyê di nav hin dewletên Erebi de bi navê “Bihara Erebi”, ku ji aliyê girûpên Îslamîk yên radîkal wekî girûpa “Îxwan Elmis-lmîn û Qeter”, herwisa hin dewletên herêmî wekî Tirkîyê û Îranê ve hatin bikaranîn, bi taybetî di krîza Sûriyê de ku van herdu dewletan mî-fayek mezin bi deşt xistin hem ji ber lawaziya rola dewletên Erebi û ji aliyekî din ve ji ber nebûna îradeyek navnetewî ya raşteqîn ji bo guhertina rejîma Şamê.

Deştkevtên Tirkîyê li Sûriyê gelekî ji deştkevtên Îranê mezintir in, nemaze ku îro hemû deştkevtên Îranê yên li Sûriyê bûne armanca êrîşên Îsraîlê, bi piştgiriya Amerîka û bêdengiya Rûsyayê, û ev yek tê wê wateyê ku hebûna Îranê li Sûriyê nayê pejirandin ji aliyê Îsraîl û Rûsya û Amerîkayan ve, berevajî ku hêjî Tirkîya daxwaza bideşt-xistina deştkevtên din li Sûriyê dike û dûbare gefên nû ji bo dagîrkirina tevaya navçeyên Rojavayê Kurdistanê dixwe.

Tevî ku heta niha ti nexşerêyek yan lihevkiyên ji bo çareserkirina krîza Sûriyê di navbera Amerîka û Rûsya de nehatiye ragihandin, lê îro hin xalên hevbeş dikevin di rojevê de, ji wan bi taybetî lawazkirina rola Îranê li Sûriyê bi yekcarî û nûkirina tîkiliyên dewletên Erebi ligel rejîma Şamê, tevî ku dibe planek yan rêkev-tineke nehîni bi heman awayî di navbera Amerîka û Rûsyayê de li hember zêdegaviyên

Tirkîyê û dagîrkariya wê ya li Sûriyê hebe, lê heta niha ti helwestek zelal ne ji aliyê Rûsya û ne jî, ji aliyê Amerîka û Îsraîl ve li hember zêdexwaziyan Tirkîyê li Sûriyê nîne.

Raşt e ku Tirkîya tîkiliyên bihêz ligel her yek ji Amerîka û Rûsyayê heye, lê herwisa nakokiyên wê jî ligel herdu dewletan heye, nemaze ku nakokiyên wê ligel dewletên Erebi yên bihêz wekî Misr û Erebiştana Siûdiyê û herwisa ligel Yûnanîstan, Ereminîstan, Qubris û Feransayê heye, zêdebarê nakokiyên wê yên dîplomasi li vê dawiyê ligel balyozên deh welatan di nav de balyozên her yek ji Amerîka û Almaniya, herwisa nakokiyên wê ligel Îsraîlê bi sedema piştgiriya tevgera Hemas û binçavkirina du hevvelatiyên Îsraîlê berî çend rojan bi gunehbariya sîxûriyê bo îstîxbarata Mossad, tevî ku opozisyona Tirkîyê daxwaza encamdana helbijartinên pêşwext dike bi sedema zêdebûna qeyrana wê ya aborî ku ber bi aqarek xirab ve diçe, nemaze ku hewldanên wê ji bo derxistina gaz û neftê ji deriya Spî tîk şikeştin û herwisa dibe ku Almaniya jî piştî şikeştina Angela Merkel, bi heman awayê berê piştgiriya aborî û siyasî ya Tirkîyê neke, ku îro Feransa û Yûnanîstan rolek mezin û cidî ji bo dîrxistina Tirkîyê digerin, ku hem Yekîtiya Ewropî û hem NATO bi awayê berê namînin, bi taybetî ku NATO ber bi encamdana erkên zanîstî-teknolocî wekî mijarên seqayê û paraştina jîngehê ve diçe, ku NATO ti pêwîstiyek bi Tirkîyê nîne nemaze piştî tîkiliyên wê yên bi Rûsyayê re, û heta Tirkîyê bi xwe vê yekê dizane, lewra xwe bihêtir nêzîkî Rûsya, Çîn û Îranê dike. Li gorî hin raportên navdewletî ku hewl dide tîkêve di nav Rêxistina Shanghai “SCO” de, ku Tirkîye heta niha ji aliyê Çînê ve nehatiye pejirandin ji ber piştgiriya wê ji çeteyên terorîst yên “Ûygûr” re, herwisa ku Tirkîya niha kar ji bo avakirina reaktor û bernameyek nuklerî dike.

Em wekî Kurd baş dizanin ku dewleta Tirkîyê heta çiqasî dijminatîya gelê Kurd dike û metirsiyek herî mezin li ser hebûna me çê dike, lewra ku lawaziya wê bîgomî dikeve di xizmeta doza Kurdî de û li gorî xwendina min ku îro Tirkîya bi siyaseta Erdogan û bi krîzên xwe ve ber bi korerêyekê ve diçe, ku hikûmeta Erdogan nikare heta krîza xwe ya aborî jî çareser bike, û heta hikûmetek nû jî bihête damezrandin ew jî wê bi hêsanî nikare krîzên Tirkîyê yên siyasî û aborî çareser bike, ji ber ku li pêşberî qeyranek mezin e.

Kurdên Rojava bi rêya serxistina yekrêziya xwe û serxistina diyaloga kurdî-kurdî dikarin mî-fahkek mezin ji qeyrana Tirkîyê bibînin, hevdem ligel dîrxistina Îranê û lawaziya rejîma Şamê ku dikarin bibin xudan statuyek cografî û netewî, ku ev yek ji bo Kurdên Bakur jî dibe bibe derfetek baş û erênî ji bo misogerkirina hin daxwaz û deştkevtên netewî û lawazkirina pêgeha şofînzma Tirkî.



Kolberek din li ser sînore bajarê Newsûdê hate birîndarkirin

Sibêdeha îro Duşemî 1'ê Sermawezê, kolberekî Kurd ê bi navê “Se`idî Rehîmî” xelkê gundê “Canewere” ê ser bi bajarê Merîwanê bi sedema teqeya hêzên leşkerî yên rejîm Îranê li ser sînore bajarê Newsûdê hate birîndarkirin.

Ew kolbere tevî hejmarek ji kolberên din bi bê agehdarkirina berê raştî teqeya raşterast a hêzên leşkerî yên rejîmê hatin.

Ew kolbere bo tedawiya pizîşkî bo navendên dermanî hatiye veguhestin.

Her di vê derheqê de, êvareya roja Yekşemî 30`ê Xezelwerê, kolberekî Kurd



ê bi navê “Selahedîn Elîweysî” xelkê gundê “Kîsle” ê girêdayê devera navendî ya bajarê Sela-sabawacanî bi sedema teqeya hêzên leşkerî yên hikûmetê ji bilindahiya sînore bajarê Newsûdê hate birîndarkirin.

Herwisa êvareya roja Yekşemî 30`ê Xezelwerê, 5 kolberên xelkê bajarê Sela-sabawacanî bi sedema bûyerên hatinûçûnê li geviya “Milepalinganê” hatine birîndarkirin.

Di heyama 7 mehan de 24 kes bûne qurbaniyê bûyerên ser kar

Birêveberê Pizîşkê Yasayî ê parêzgeha Kirmaşanê “Selîm Xanî” di hevpeyvînekê de digel Nûçegihaniya hikûmetî “Fars” ragihand: “24 kes (23 mêr û 1 jin) li heyama 7 mehên destpêka îsal, bi sedema bûyerên ser kar di wê parêzgehê de canên xwe ji dest dane”.

“Selîm Xanî” îşare bi sedema qurbaniyên bûyera li ser kar kir û got: Zêdetirîn qurbaniyên ser kar berbûn ji bilindahiyê bûne”.

Wî berpîrsê hikûmetê ragihand: “Zêdetirîn bûyerên kar li beşa bînasaziyê hatiye qewmîn.

Berpîrsê pizîşkê yasayî yê parêzgeha Kirmaşanê îşare bi bûyerên hatinûçûn li heyama 7 mehên destpêka îsal kir û got ku 303 halet bûne û pêka sala derbasbûyî (1399`an) ku 277 haletên canjidestdanê bûne, 26 kes zêde kiriye.



Herwisa “Selîm Xanî” îşare bi canji destdana welatîyên bi sedema hilmijîna gazê kir û got: “Di heyama 7 mehên destpêka îsal de, 10 kes (6 jin û 4 mêr) bi sedema jehrawîbûn bi gaza Munoksîda Kerbonê canê xwe ji dest dane.

Nebûna kepsûlên gazê di devera Mirgwer de bûye pirsgirêk bo xelkê

Heyama zêdetir ji çendîn heftiyan e ku di devera Mirgwer de kepsûlên gazê gelek bi zehmet peyda dibin û divê xelkê wê deverê çend demjimêran di rêza wergirtina kepsûlan de bisekinin.

Kêmbûn û nebûna kepsûlên gazê di devera “Mirgwer” a ser bi bajarê “Urmîyê” de heyamek zêde ye bûye arîşeyek mezin bo xelkê wê deverê û di demsal sirê de xelk neçar in çendîn demjimêran di rêzan de bisekinin heta ku bikarin kepsûlekê bi

dest bixin.

Rêjeya kêmbûna gazê bi qasekê ye ku bi awayê cîrebendî û bi kartên taybet û rêzên dûr û dirêj bi xelkê re tê danê.

Ew pirigirêke bo gundên deverê yên wekî “Dize, Xurasp, Bawa, Filkan, Kanîdeştar, Zêwe, Jarawa, Girdiwan û...” bûye arîşeyek mezin û dengê nerazîtiya xelkê bilind kiriye.

Heta niha hewla kesên



pêwendîdar yên wê deverê bê encam maye û nekarîne ew pirsgirêkê çareser bikin.

Belgefîlmek li ser Çiyayê Agirî tê çêkirin

Çiyayê Agirî li seranserî Tirkîyê û Bakurê Kurdistanê wek çiyayê herî bilind tê hejmartin. Di salên 1959an de, di çend wêneyên hewayî de hinek dûmenên weke bermayiyên keştiyekê li vî çiyayî hatin tomarkirin. Hinek lêkolîneran îdia kirin ku ew bermayiyên Keştiya Nuh in.

Piştî vê yekê beşeke zêde ya lêkolîner, geştîyar û derhênerên belgefilman berê xwe dan Çiyayê Agirî û gelek kanalan li Tirkîyê belgefilm li ser çêkirin. Niha jî kanala Amerîkî ya bi navûdeng 'History Channel' hewl dide belgefilmekê li ser vî çiyayê Bakurê Kurdistanê çêbike.

Sait Yardimci, Serokê Komîsyona Filman a Tirkîyê, diyar dike, "Armanca me ew e ku bi vê belgefilmê, zêdehiyekê li geştîyariya Tirkîyê bikin. Ji ber ku Agirî bi Keştiya Nûh bi navdartir bû. Dema ev proje temam bû dê di danasîna Agiriyê de rolek girîng bilîze. Hûn dizanin History Chanel kanala herî girîng a belgefilman e. Ez bawer dikim ku ev belgefilm dê xîtabî zêdeyî 1 milyar mirovan bike. Bi rastî jî dê



belgefîlmek gelek girîng be."

Li gor hinek bawerîyan piştî tofanê, keştiya Hz. Nuh li serê vî çiyayî rawestiyaye û ji ber vê yekê Çiyayê Agirî weke çiyayekî pîroz tê dîtin, lê heta niha jî ev mijar di nav lêkolîneran de cihê nîqaşê ye. Lêkolînerê Amerîkî Andrew Jones ku bi salan e li ser li vî çiyayî lêkolînan dike, dibêje mijara Keştiya Nuh dê gelek bala cîhanê bikêşe.

Andrew Jones, Lêkolînerê Amerîkî, dibêje, "Ev mijar ji bo rojava û krîştiyanan gelekî girîng e. Li Amerîka xelk dixwazin bizanin cihê keştiya Nuh li ku derê ye. Li gor pirtûka Încîlê Keştiya Nuh li ser çiyayê Ararat runiştîye. Niha eem li wî cihê ne. Ji ber ku daxwazeke zêde li ser vê mijarê heye gelek kes tîrên vî navçeyê û li pey keştiyê digerin. Vê keştiyê bala gelek geştîyaran kêşaye. Ew dixwazin cihê wê yê li çiyayê Ararat bibînin. Ji ber van bermayeyan girîngiyeke zêde bi vê derê tê dayîn. Ji ber vê yekê jî ev mijar dê gelek bala cîhanê bikêşe."

Bilindahiya Çiyayê Agirî ku weke çiyayê Ararat jî tê binavkirin, ji deryayê 5 hezar û 137 metre ye. Tevî ku pirtûka pîroz a ola Krîştiyanîyê Încîl dibêje piştî Tofanê Keştiya Nuh li vî çiyayî rawestiyaye, lê pirtûka pîroz a Îslamiyetê Quran jî dibêje ew keştî li ser Çiyayê Cûdî yê parêzgeha Şîrnexê rûniştîye. Ç: RÛDAW

Ema Sazbend koça dawî kir

Hunermend û sazbanda Kurd Ema Sazbend (Emîne Afşîn), li parêzgeha Dîlokê ya Bakurê Kurdistanê canê xwe ji deşt da.

Hunermend û sazbanda Kurd Ema Sazbend (Xecê) a ji navçeya Bêhiştî ya parêzgeha Semsûrê ya Bakurê Kurdistanê îro di 85 saliya xwe de li Dîlokê canê xwe ji deşt da.

Ema Sazbend (Emine Afşin) kî ye?

Sala 1936an li gundê Hecî Xelîl ser bi navçeya Bêhiştî ya Semsûrê ji dayik bû. Di yek saliya xwe de sêwî dimîne. Diya wê, Ema Sazbend û birayê wê mezin dike. Ji eşîra Reşî (Reşwan) bû

wek "Ema Sazbend" û "Ema Xecê" dihat nasîn. Dengbêj û helbestvaneke navdar bû.

Di temenê xwe yê biçûk de tê zewicandin û piştî mîrê wê canê xwe ji deşt dide. Piştî koça dawî ya mîrê wê, tiyê wê dixwaze bi wê re bize-wice, lê ew qebûl nake. Li ser zextê tiyê xwe bo zewacê, ji ber soz daye mîrê xwe bi kesî re nezewice, tiyê xwe di-kuje û salên dirêj di girtîgehê de dimîne.

Di girtîgehê de dibe dengbêj û helbestvaneke mezin û zêdetir helbestên dilşewat dixwendin. Sala 1983yan ji Semsûrê koça Dîlokê dike û îro di 85 saliya xwe de canê xwe ji deşt da. Ç: RÛDAW



Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

Du welatîyên din ji aliyê hêzên ewlehî ve hatine binçavkirin

Roja Çarşemî 26`ê Xezelwerê, welatîyekî Kurd ê bi navê “Zagros Reşîdî” kurê “Se`îd” û xelkê gundê “Çoman” ê ser bi bajarê Baneyê, ji aliyê hêzên ewlehî ve hate binçavkirin û bo cihekî nexuya hate veguhaştin.

Pêka gotina çavkaniyek agehdar, hêzên ewlehî bi bê hebûna ti belgeyek yasayî êrîş kirine ser mala wî welatîyê Kurd û navbirî binçavkirin.

Herwisa wê çavkaniyê got: “Hêzên ewlehî maşîna wî welatîyî ji zevt kirine”.

Roja Pêncşemî 20`ê Xezelwerê, “Se`îd Reşîdî” bavê wî welatîyî, bi bê hebûna ti belgeyek yasayî ji aliyê hêzên ewlehî ve hatiye binçavkirin û heta niha ji qedera navbirî ti zanyariyek di ber deşt de nîne.

Ji aliyek din ve, roja Pêncşemî 20`ê Xezelwerê welatîyek din ê bi navê “Kerîm Firûzîş” xelkê gundê “Necnê” yê ser bi bajarê Baneyê, ji aliyê hêzên ewlehî ve hate binçavkirin û bo cihekî nexuya hate veguhaştin.

Di wê derheqê de roja Pêncşemî 20`ê Xezelwerê, 15 welatîyên Kurd bi bê hebûna belgeyên yasayî ji aliyê hêzên ewlehî ve li bajarê Baneyê, hatine binçavkirin û bo cihek nexuya hatine veguhaştin.

Hûşmend Elîpûr deşt avête gireva birçîbûnê

“Hûşmend Elîpûr”, girtiyê siyasî yê Kurd xelkê bajarê Serdeştê ji roja Sêşemî 25`ê Xezelwerê ve bi nîşandana nerizayetiya xwe li derheq erênêkirina mirexesiya wî û tedaxula îdareya îtil`ata bajarê Sineyê li dosiya wî, deşt avête gireva birçîbûnê.

Roja Sêşemî 25`ê Xezelwerê, taya 4 a birêvebirina ehkam a cezakirinê ya bajarê Sineyê, digel daxwaza mirexesiya girtiyê siyasî yê Kurd ê girtiyê girtîgeha navendiya wî bajarî “Huşmend Elîpûr”, dijayetî kir.

Taya 4 a birêvebirina ehkama keyferî ya bajarê Sineyê bi sedema dijayetî digel madeya 513 a yasayên Olî ya dadresê keyferî digel daxwaza wî girtiyê siyasî dijayetî kirin.

Di meha Rezbera sala 1399`an de ew girtiye piştî hilveşandina cezaya îdamkirina wî li dîvana bilind a welat û dadgehîkirina dubare, bi 38 meh girtîgehê hate cezadan.

Di roja Sêşemî 25`ê Xermanana sala 1399`an de cezaya îdamkirina “Huşmend Elîpûr” li dîvana bilind a welat hate helveşandin.

Di meha Befranbara sala 1398`an de dadgeha Şoreş a bajarê Sineyê, girtiyê siyasîyê Kurd “Huşmend Elîpûr”ê xelkê bajarê Serdeştê bi îdamê û girtiyê siyasî yê Kurd “Mihemed Ostadqadir” û xelkê bajarê Seqizê bi 5 sal girtîgeha te`izîrî mehkûm kiri-bûn.

Di roja Yekşemî 8`ê Befranbara sala 1398`an de ew cezayane bi malbat û parêzerên wan du girtiyên siyasî hatibû ragihandin.

“Mihemed Ostadqadir”, li 2`ê Banemera sala 1399`an, bi awayekî demkî ji girtîgeha bajarê Sineyê hatibû azadkirin.

Ew du girtiyên siyasî yên Kurd, li 9`ê Xezelwera îsal, bi tohmata “bexî” (dijayetî kirin digel xwedê) bi beşdariya “Elî Sakinî”, parêzerê dosiyên wan li taya 1 a dadgeha Şoreş a bajarê Sineyê, hatibûne dadgehîkirin.

Ew du girtiyên siyasî yên Kurd, li 12`ê Gelawêja sala 1397`an bi tohmata “endambûn li yek ji Partiyên Kurdî yên dijberî hikûmeta Îranê”, ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibûne binçavkirin û piştî 108 roj ji binçavkirina wan, li roja 28`ê Xezelwera heman salê bo qerentîneya îdareya Îtîla`ata bajarê Sineyê hatibûne veguhaştin û ew du girtiyên siyasî piştê li 5`ê Befranbara sala 1397`an bo girtîgeha navendî ya bajarê Sineyê hatibûne veguhaştin.

Piştî binçavkirina wan du girtiyên siyasî, deng û rengê hikûmeta Îranê îtirafkirina bi zorê ya wan du welatîyan belavkir, piştê malbatên wan du girtiyên siyasî ragihandin ku ew îtirafkirinên wan bi sedema givaş û îşkenceya hêzên Îtîla`atê bûye.

Wêneyên bi dawîhatina dewreya destpêkî ya Hêza Pêşmerge Kurdistanê

